Gotarên Mêyane

Edîb û Edebiyat

Tirîfe Doskî

Çi cure nivîsînên din neşên cihê edebî bigirin. Edeb ne gotareka siyasî ye. Ne gotareka yasaye û ne abûriye û ne siyasiye. Bi zimanên ferhengî her kes dişê nivîsîneka din binivîse. Lê nivîsîn di warê edebî de tinê di ferhenga ruhê, derûn û mêşkê mirovî ve girêdaye.

Edebî tamek, rengek, hestek û şêwazeka din heye. Ew berhemê ebistimî û dahênana edebî şiyanên livandina hizra mirovî bi hêz dixe. Ew nivîsîna edebî cudabûna xwe diselmîne li gel warên din wek "ayîn, abûr û zanistên siruştî" ev hemû ware, xwe li çarçêwek, sîstem û neziriyatên xwe diselmînin û hebûna gotara wan ji naveroka babetî pitir dernakeve. Belê edeb dibe ketwarekê nû çê û enalîz dike bi şêweyek estatîkî û hunerî şirove dike. Ketwareke edeb bi xwe dirust dike, nehîniya edebî ewe ewdalbûne bi dunyayeka nû. Edeb bi zimanekê ne rojane û ne zimanê gotaran dihêt û keşfa rasteqîne ya zor diyardeyên hebûn û dunyayî dike. Edeb di binema xwe de hêzeka sinûrşikêne dişê wan tiştên ku ketwar neşê bibîne tenha di çarçêweyê xwe de nebe. Belê edeb derveyî çarçêweyî heye û dibîne û dinivîsîne, edeb bi zimanekê nazik, xweş û tijî nihênî û estatîka edebî, lê:

Aya edebê niho li gel edebê caran cîwaze û aya armancên nivîsînê heman armance?

Aya edeb şiyaya bibe edebekê rasteqîne?

Aya edîb dema dinivîse dizane ew ya nivîsîn êdî nabe milkî wî û çi dixana xwendin, rexnê û vekolînê de?

Her nivîsînekê baca xwe ya taybet heye li gor babetî?

Lew giringe ji xwe bipirsin, aya ew nivîsînên em dinivîsîn dikevne dixana edebî de?

Aya deqên felsefî diçine heman xana edebî?

Bo felsefe û ji ber gengeşe berdewam hebûye li ser peywendiya mêjûya felsefe û edebiyatê û raya Eflatonî li ser yutabya û cîwazkirina di navbera polîtîka û fîlosofiya giringe. Lê, bila berdewam em wek nivîser, nek rewşenbîr pirs bikin çima felsefe?